Wezareta Perwerdehiyê ya NSW

# Perwerdehîya ji bo îmkaniya Bilind û Jêhatî li Dibistanên Giştî yên NSW - Rêbernameyek ji bo dê û bavan û çavdêran

Perwerdehîya ji bo îmkaniya Bilind û Jêhatî (High Potential and Gifted Education (HPGE)) alîkariya hemû xwendekarên dibistanên giştî yên li NSW dike ku girêdayî û hêvîdar bin di fêrkirinê de, bi vê awayî ku pêwîstiyên taybet ên wan di fêrgehê de tên girtin. Ev bername di çar qada îmkanan de tê bikaranîn: afirandî, zihnî, laşî, û hestiyariya civakî.

## 4 qadên îmkaniyê

Qadên îmkaniyê 4 cureyên sereke yên şîyanên xwezayî ne ku mirov dikarin xwedî bin. Ew gelek caran dikevin bin bandora hevdû. Ev domaîn in:

**Qada Afirîner** – tê wateya qabilîyetên ku xeyal, resenî û çêkirina fikrên nû tê de ye. Dibe ku ev karîn di zarokan de xuya bibin bi riya nivîsandina kurteçîrokekê, saz kirina straneke, xêzkirina posterekê, pêşxistina çareseriyekê bêhempa ji bo pirsgirêka matematîkê, an jî koreografiya dansê.

**Qada zihnî** - behsa karînên têgihiştina fikrên tevlihev, çareserkirina pirsgirêkan û sepandina zanînê dike. Wek mînak, zarokek dikare bi lez û bez hîn bibe, an jî têgihiştineke kûr a felsefe, zanist an jî pirtûkan nîşan bide.

**Qada fîzîkî** - di tevgera mirovan de qala qabilîyetên xwezayî dike. Mînak, di dema aktîvîteyên werzîşê de, dirûnkarî, marangoztî an jî endezyarî. Dibe ku ev qabilîyetên li sinif û lîstikan, herweha bi dersên derveyî kursî û derfetên civakê û pêşbirkan bên dîtin.

**Qada hestyariya civakî** - qala qabilîyetên di rêvebirina hestên xwe û yên din de dike. Dibe ku ev qabilîyet bi hevbandorîyên bi hevalên polê, mamosteyan û dê û bavan an jî kargeran re bihên nîşandan. Bo nimûne, dibe ku zarokek ji xwe bawer be û di pêşengî û xebata bi kesên din ra baş be, an jî behremendîyên karsazan nîşan bide.

## Çawa dibistan piştgiriyê didin xwendekarên xwedî îmkaniyên bilind û jêhatî

îmakniya zarokekî dikare cuda be, ji ber vê yekê dibe ku pêwîstî bi cureyên cuda yên piştgirî û hînkirinê hebe. Wekî mînak:

**Xwendekarên xwedî îmkaniya bilind** ew in ku karîbûna wan ji xwendekarên heman temenî bilindtir e, û ew dikarin ji wan re bêtir zehf bibin.

**Xwendekarên jêhatî** li gorî xwendekarên heman temenî xwedî qabilîyeteke pir bilind in û dema ku derfet werin dayîn dikarin behreya xwe bi lez û hêsanî pêş bixin.

**Xwendekarên pir jêhatî** xwedî şiyanên awarte ne û ji bo ku pêdivîyên xwe yên hînbûnê yên pêşketî bi cih bînin, dibe ku hewcehîya wan bi sererastkirinên girîng hebe.

Dibistan bi pratîk û bernameyên cûrbecûr piştgiriyê didin xwendekarên xwedî potansiyela bilind û jêhatî. Ev dikarin di nav xwe de vehewînin:

- Dersên ku zehmetiyê û îlhamê didin xwendekaran
- çalakiyên dewlemendkirinê û bernameyên derveyî kursiyê
- Xwendekaran bi kesên din ên bi heman şiyanê re kom bikin
- Rêçikên fêrbûna pêşkeftî yên wekî lezbûnê (di dersê de zûtir derbas dibin) dema ku guncaw be
- piştgiriya tendirûstî û pêşxistina şarezayên civakî.

Armanc ev e ku alîkariya xwendekar bikin ji îmakiya bilind derbasî performansa bilind bibe – eger ew zanist, teknolojî, endezyarî û matematîk, ziman, huner, spor, rêberî an jî qadeke din de be.

## Her xwendekarek bêhempa ye

Xwendekarên xwedî îmkaniya bilind, dikarin ji paşxaneyan werin, tevî astengdaran an jî ji paşxaneyan û komên zimanên cuda. Hin kes jixwe li dibistanê pir baş in, lê dibe ku ji bo yên din jî ji bo ku tiştên xwe yên herî baş bikin hewcehîya hinekan bi alîkarîya zêde hebe. Ev şaşiyek gelemperî ye ku xwendekarên hêja ne hewceyê piştgiriyê ne ji ber ku hinek dikarin hewceyê alîkariya taybetî hewce ne ku ji bo eleqedar bimînin û li dibistanê baş bikin.

## Eger hun bawer dikin ku îmkaniya zarokê we zêde ye an jî dibe ku jê hatî bexşkirin çi bikin

Heger hun difikirin ku îmkaniya zarokê we zêde be an jî jêhatî be, ji kerema xwe vê bi mamosteyê zarokê xwe ra nîqaş bikin. Dema hun bi mamoste re diaxivin, ji kerema xwe mînakan bidin bê ka zarokê we li her qadekê nîşaneyên potansiyela bilind an jî jêhatîbûnê çi dike.

Dê û bav û çavdêr di hînbûna zarokên xwe de, parvekirina fikrên der barê zarokê xwe de û bi hevkariya dibistanê re roleke girîng dilîzin.

## Siyaseta HPGE

Siyaseta Perwerdehîya ji bo îmkaniya Bilind û Jêhatî li her dibistaneke giştî ya li NSW'ê dihê bikarînan. Ew alîkarîya mamosteyan dike ku bizanin ka kîjan potansiyela bilind û xwendekarên jêhatî hewce ne û çawa derfetên mezinbûn û serkeftinê ji wan re peyda bikin.

## li ku derê zaniyariyên xêdetir bidest bixin

- Her dibistanek giştî ya li NSW çalakiyên HPGE'ê pêşkêş dike. Ji kerema xwe ji bo hûrgilîyên zêdetir serî li malpera dibistana zarokê xwe bidin.
- Dibe ku hun bixwazin bi mamosteyên zarokê xwe re biaxivin da ku bipirsin bê ka dibistan çawa piştgirîdide îmkaniya bilind û xwendekarên jêhatî.
- Seredana malpera Perwerdehîya ji bo îmkaniya Bilind û Jêhatî ya Wezaretê bikin ji bo li siyaset û çavkanîyan binêrin.

## Xizmeta wegêrên li ser telîfonê

Heger pêdivîya we bi alîkarîya wergêran hebe ji bo ku hun bi dibistana zarokê xwe re li ser perwerdehîya ji bo îmkaniya bilind û jêhatî biaxivin, ji kerema xwe telîfonî 131 450 bikin, ji opêratorê re bibêjin ka pêdivîya we bi çi zimanî heye û ji wan bixwaze ku telîfonî dibistanê bikin.

Ji bo alîkarîya we, opêrator dê wergêrekî li ser xetê bistîne. Ev xizmet belaş e.